



Danezana Nyéléni ya 17em

Edîtoryal – Ciwan û Çandinî

Ji bo rizgariya gelên me û veguherîna rastiya me, me qerar daye ku em tekoşîna xwe ya dîrokî bidomînin, ji ber ku heke ciwan beşdar nebin, em nikarin serbestiya xurekên xwe li dahatuyê jî biparêzin. Em wek ciwanên La Via Campesina, divê em bizanin ku ev tekoşîn û xebata me şayanî rêzgirtinê ye û di vî karî de lazim e em berdewam bikin. Me ji bo Civîna 3yem a Navdewletî ya Ciwanên La Via Campesina, mijarên sereke wiha diyar kirin: Arkeolojî, guherîna rewşa şiruştî û enerjî, koçkirin, serdestiya xurekan, herêm û hevbeşiyên me û herî dawî jî tendirustî. Ev proseya ku sala 2004ê dest pê kir, bi saya nîqaş û gengeşeyên me, bû bingeha veguherîna stratejiya vîzyona çandiniyê û herwiha bi awayekî radîkal, bû perçeyek ji wê armanca me ya avakirina civakeke nû. Wek gundî û rêncber, koçber û niştocih, ciwanên vê cîhanê, em baş dizanin ku heta em gazî hemû ciwanên din jî nekin û bi hev re meydanê nexwînin ji bo vê pergala rûxîner ku her roj zêdetir însanan dukuje û cîhana me tune dike, em nikarin vê çerxa talan û xirakirinê bişkinin. Û wek Ciwanên La via Campesina, em vê bangewaziyê li hemû ciwanên cîhanê dikin ku ji bo parastina xurekên xwe, li dor rêxistinên wisa, hema aniha bibin yek!

Tevgera Navdewletî ya Ciwanên La Via Campesina

Ronîkirina Armancê

Ciwan çalak in: Vîzyona tekoşînê ji bo parastin û serdestiya xurekan

Gundiyên ku li ber xwe didin û hem axa xwe hem jî xurekên xwe diparêzin, bi saya alîkarî û piştgiriya ciwanan ji bo avakirina dahatuyê nû dest bi xebatê kirine. Ciwanên ku mirov in, ciwanên ku dinya ew bi xwe ne.

Li her derê dinyayê, li gund û çolteran, ciwan rastî gefxwarin û talûkeyeke mezin tînin: Dinya bi awayekî radîkal diguhere û ciwan neçar in ku daxwaza berxwedana hemû rêncberan bikin yek. Li her derê dinyayê sîstema neolîberal kapîtalîst, bi piştgiriya rêvebirên hikûmetên herêmî û navdewletî, ji bo pergaleke çandiniya endustriyel û ekonomiyêke dîzaynkirî, li gel pergaleke siyasî bi zorê da qebûl kirin. Ev pergala ku axê, avê, daristanê û tovên çandiniyê jî tê de her tiştî dixwaze bifiroşe sermayedaran, çavkaniyên siruştî dide ber destê şîrketan û mîratelya cîhana me, ku dayika me hemûyan e, tehrîb kir.

Tekoşîna li hember pergale:

Li her derê dinyayê, ciwan li hember sîstema neolîberal kapîtalîst radibin ser xwe. Li kolanan, li bajar û gundan, tekoşînekê dimeşînin da ku rêyên nû ji bo civaka me û cîhana me ya tekane peyda bikin.

Ji ber endustriyalîzekirin û bazirganiya vê sîstemê, li her derê cîhanê kêman kes mane ku ji destpêkê heta firotinê, xwe bi xwe dikarin di hemû warên çandiniyê de bi serbestî bibin xwedî kontrol. Ev pergala herwisa rê li ber digre ku her cure xurekên organîk û siruştî ji çavkaniyên wan ên xweser ji aliyê rênçberan ve bê belavkirin. Ji ber ku bazar di bin kontrola vê pergale de ye û ew bi xwe li gor berjewendiyên xwe piştgirîya çandiniya nesiruştî û erzan dikan, lewma jî rênçber nikarin reqabetê li gel xurekên îthal bikin. Berî her tiştî ev sîstem rola rênçberan di nav civakê de kêman û qels dikan û li hember vê jî ciwanan ji bo parastina vê rola girîng a rênçberan dest bi tekoşînê kirine. Ji bo parastina berhemhêneriya xurekên civaka xwe tekoşînê dimeşînin, ji bo parastina axa xwe tekoşînê dimeşînin, ji bo parastina tovên siruştî, ji bo mafê rewşa yê parastina zanebûna kelepora çandiniyê û mafê berhemhêneriya rênçberan. Û niha vê parastina xwe bi rêyên nû, armanc û wateyên nû dimeşînin.

Li gor nêrîna ciwanan, armanca sereke û parçeya herî muhîm ya vê tekoşînê, li hember bidestxistin û firotina 'erdên çandiniyê ye ku li her derê dinyayê gelek sayt û bajarên mezin li ser wan tene avakirin. Lewma jî li her derê dinyayê, li gund û bajaran, rênçberên ciwan hin cihan dagîr dikan, dest danînin ser da ku xurekên herêmî biçînin. Bi vî hawî li hember sîstema neolîberal kapîtalîst ku li her derê dinyayê terzejiyana civakê dixwe ber xetereyê mezin, ciwan dest bi dagîrkirina hin qadan dikan û li hember xirakirin û firotina 'erd û zeviyên çandiniyê ji aliyê kompaniyayên mezin ve, bi rênçberiya xwe ya herêmî serî hildidin.

Ne pêkan e ku ev sîstema endustriyel a çandiniyê dahatuyê xweş û geş pêşkêşî mirovahiyê bike. Em hemû şîrkên çavkaniyên dinyayê ne, dinya 'ayde me ye û em 'ayde dinyayê ne. Tekane rêya berxwedanê serdestiya xurekên surîştî ye û encax bi parastina serdestiya xurekan em dikarin çavkaniyên hevpar ên mirovahiyê û jiyanê xwe ya siruştî biparêzin û li hember pergala cîhanê ya hevdem li ber xwe bidin ku wek pergaleke ekonomiyê neolîberal û kapîtalîst e.

Tekoşîn ji bo parastinê..

Berxwedana ciwanan, li hember kolonyalîzmê ev 500 sal e berdewam e û ji bo xeyalkirina jiyanê nû ku li gel siruştê û ekosîstema wê (Pachamama) hevaheng e. Ciwan bi eşq û evîneke qedîm, ji bo pêkanîna terzejiyanê cuda niha jî tekoşîna xwe didomînin. Li 70 welatên dinyayê ji 160 organîzasyonan¹ zêdetir niha di nav vê tevgerê de cih digrin û mirovên Via Campesinayê bi dîroka kevnar a vê tekoşînê, li gel berxwedana rênçber û gundiyan, hêza xwe tevî hêza wan dikan.

Li hemû parzemînan, ciwan nîşanî me didin ku em dikarin cîhanê din ava bikin. Ji aliyê ve ciwan ji bo parastina xurekên xwe li ber xwe didin, ji aliyê din ve mil bi mil ev tekoşîn li gel ciwanên din dibe tevgerê berxwedan û numayîşê. Nimûneyên vê li gelek cîhan derketin meydanê: Li Brezîlyayê bi berxwedana kooperatîfên MTSyê, li Endelosa Îspanyayê bi destdanîna ser 'erd û zeviyên, li Afrîkaya Başûr bi tekoşîna GMyê ya ji bo garîsê, li Hindistanê bi serhildana rênçberan li dijî Monsanto. Ji aliyê din ve jî bi xebata sazî û dezgehên rêxistinên alîkar, ciwanan xwe bi xwe biryar dan ku rêveberiya xweser pêk bînin, di nav vê tevgerê de bi pirdengî, çalakiyên xwe bi rêyên nû bidomînin û berxwedana xwe bidin meşandin. Li kolanên gelek welatan em dibînin ku destpêka tevgerên wek Occupy ango tevgera îşxal û dagîrkirinê, Indignados, ango ciwanên hêrsbûyî û Bihara 'Ereban, bi saya van rêxistin û sazîyên ciwanan, ji nav civakê bi xwe hatiye organîzekirin. Destpêka van tevgerên mezin û berbelav, bi saya vê tekoşîna ciwanan, di nav civakê de ji jêr ber bi jor ve hatiye avakirin.

¹ La Via Campesina Navdewletî

Ciwanên cîhanê, ji bo mafê rewa yê reforma axê, zeviyên rênçberan û mafên rewa yên kedkarên çandiniyê têdikoşin. Herwiha ciwan ne li hember tebî'eta bi bêr û bereket, ji bo wê li ber xwe didin û dixwazin pergaleke çandiniya ekolojîk pêk bînin û mafê hemû însanan ji bo sistemeke siruştî û xurekên organîk bê parastin; ji ber ku siruşt mîrateya me ya hevpar e û xizmeta temamê mirovahiyê dike. Ji bo ku bazara endustriyel zorê nede wan û bikaribin berhemên xwe yên çandiniyê bifiroşin, wek alternatîf bazarên herêmî û pêwendiyên nû ji bo kîrîn û firotinê digerin. Ekolojiya çandiniyê, li gel vîzyona herêmî ya prensîbên ciwanan ên li ser modela ekolojî û ekonomiyê, herwisa dibin modelên siyasî û çandî. Lewma jî ciwan dixwazin hem ji bo roja îro hem ji bo dahatuya xwe vê modelê pêk bînin.

Ciwanên dinyayê ji bo wekheviya zayendî tekoşîna xwe didomînin û li hember sîstema pederşahiya civakê li ber xwe didin. Hem ji bo mafên rewa yên jinên rênçber têdikoşin hem ji bo parastina tenduristiya wan a zarokanînê. Roja îro ciwanên cîhanê li gund û çîyan, ji bo her kesî, bi armanca pêkanîna şertûmercên baştir û parastina rûmeta însanan, li ber xwe didin.

Em xweş dizanin ku di vê tekoşîna me de, perwerdehî gelek girîng e lê ji bo hewcedariyên perwerdehiyê ne dewletên netewî, ne jî hikumetên herêmî nikarin bibin dermanê derdê me. Ji ber wê jî di nav tevgera me de perwerdehiya xwe bi xwe, pratîk û xebatên di nav komê de û hewldanên wek perwerdeya gel, ji bo ekolojiya çandiniyê wek çareseriyên perwerdeya însanan xuya dikin. Perwerdeyek ku ji bo jiyanê ye, ji bo fikr û ramanan û ji bo peydakirina çareseriyên nû da ku însan bikaribin xwe bi xwe organîze bikin. Perwerdeyek ku dilê me, fikrên me, peyvên me û kirinên me ji zincîrên kolonyalîzmê rizgar bike.

Ev hemû rê û dirbên li ber me ne û ciwanên wek me aniha, vê gavê li ser wan rêyan in.

Em “roja îro” ne

Gava me ya yekem herêmî ye: Em li nav zeviyan dixebitin û hewl didin ku her li qadê bin. Her yek ji me peyrewê wê modela çandiniyê û şêweya pêkanîna civakeke cuda ye ku me jê bawer kiriye û em ji bo wê dixebitin. Li nav zeviyan em dibînin ku rênçber mil bi mil bi me re ne û piştgiriya berxwedana me dikin û li bajaran jî, li her derê gel bi me re, li dijî vê sîstema ekonomiyê ya neolîberal kapîtalîst, tekoşîne dimeşîne.

Ji ber wê jî gava ya duyem, tevgera sendîkayê ye: Xebata me di her warê berxwedanê de û li gel hemû tevgerên xwe, wek alîgîrekî milîtan ê vê tekoşîne, berdewam dike û em ji bo vê ked didin. Bi vî awayî em li gel çalakger, xwendekar, rênçber, karker û koçberan pêwendiyên nû datînin û networkên berxwedanê yên berfireh pêk tînin. Heke ciwan ji bo wan li ber xwe nedin û bi wan re nexebitin, kes namîne ku li gel wan li ber xwe bide.

Em ne dahatu ne, em “roja îro” ne.

“¡Alerta, alerta, alerta que camina, la juventud en lucha de la Vía Campesina

Puxte

Zanyariya Çandiniya Ekolojîk ji bo Parastina Serdestiya Xurekên Siruştî

“Em ji bo perwerdeyekê têdikoşin ku fikr û ramanê hînî me bike, ne ku îtaetkirinê.” - Paulo Freire

Têrkirina Bîr û Hizrên Rexneyî

Ciwanên gund û çolteran, gelemperî di nav pergala perwerdeyê de marjînalîze bûne û ji bo çandiyêke malbatî nebûne xwedî bîr û hizrên çandiniya navdewletî da ku şîrket, sazî û dezgehên xwe yên biçûk ava bikin; lewma jî modeleke çandiniyê ku rê li ber rênçberên çewlikên

biçûk û berjewendiyên wan veke, mixabin ku pêk nehatiye. Zankoyên derdorê, wan qîz û xortan mezûn dikin û navê wan dibe “teknisyen” an jî muhendiz lê La Via Campesina ji sal 2006an ve hewl dide ku ew bibin piştgir û alîkarên çandiniya ekolojîk. Bi vê mebestê jî *formasiôn*² û perwerdeyeke xweser ji bo wan pêk tîne û ji bo gundî, karker û kedkarên civakê *campesinas* û *campesinosan* ava dike. Lewma jî nifşê nû dê bibe xwedî hizra parastina xurekan û ew aktivîstên vê tevgerê dê sistemeke nû a xurekan pêk bîne ku roja îro zêde zêde pêdiviya me pê heye. Ev qadên ku me behs kirî, rasterast encamên berxwedaneke civakî ne. Bi saya wê tekoşîn û seferberiyê pêk hatine ku li jêr em ê prensîbên wê yên felsefî û pedagojîk li gel bingeha perwerdeya gel rêz bikin.

Prensîbên Felsefî: Perwerde ji bo veguherîna civakî; Perwerde ji bo pirdengiyê; Perwerde ji bo milmilaneyê însanan û koperatîfan; Perwerde ji bo serhildanê.

Prensîbên Pedagojîk:

Pratik/Teorî/Pratik: Perwerdeya populer li ser vê prensîvê ye: Aksiyon, dengvedana wê û careke aksiyon. Perwerdeya rast ew e ku civakê biguherîne.

Perwerde/Hînbûn: Pêwendiyeye diyalektîk û berwarî di navbera perwerdekar û xwendekaran de, bêyî ku di nav hiyerarşiyekê de be, di navbera herdu aliyan de jî diyalogê pêk tîne û hînbûneke dualî derdixe meydanê.

Dialogo de Saberes: Tenê bi saya pîrhêliya vîzyon, perspektîf û pêşniyazan, mirov dikarin cîhana li derdora xwe têbigihin.

Perwerdeya Bingeh-Aksiyon, Tevlêbûna Xwendekaran û Lêkolîna Peywendê: Lêkolîn û perwerde her tenê û rasterast ji bo pêkaîna lazimiyên xwendekaran, malbatên wan û civakê ye. Bi ser de jî ji bo pêkanîna parastina serdestiya xurekên siruştî.

Bênder

Ew qadên ku li jor behsa wan hatine kirin, taybetiyên sereke yên perwerdeya La Via Campesina ne ku bi van tecrubeyên pedagojîk, şewazên cuda ji bo diyaloga demokratîk li platforma herî girîng ya xort û ciwanan e. Ew parazvanên xurekên siruştî ne û hêdî hêdî yekem bêndera xwe jî li nav zeviyan dikin û li gor rastiyên jiyana xwe di vê platformê de rê li ber veguherîna vedikin. Herwisa hê jî gelek sayt û deverên cuda ji bo perwerdeyê tên qewîkirin û ev perwerde li gelek gund û çolteran dibe sebebê bingehîn ji bo tevger û serhildanên civakî. Li herderê cîhanê ciwan vê pîrsa muhîm dipirsin û li bersiva wê digerin: Ji bo ku em xwe bigehînin serdestiya xurekên siruştî, divê em çî bikin?

Dengên ji Nav Zeviyê

Xortekî Bê'erd, piştî 30 salan

Raul Amorim – Kolektîfa Yekgirtî ya Tevgera Ciwanan a Rêncberên Bê'erd (MST) – Pernambuco, Brezîlya

30 sal berî niha, ciwanan bi hizra berbelavkirina vê berxwedana rêncberên bê'erd, çenteyên xwe avêtin piştî xwe ji herêma xwe derketin. Berxwedana wan ne tenê ji bo rêncberên bê'erd bû, herwiha ji bo reforma çandiniyê û veguherîna civakî jî têdikoşîn, da ku vê tevgerê bikin

² Bi spanî ‘perwerde’.

berxwedaneke netewî. Wan ciwanên berxwedêr, Tevgera Rêncberên Bê'erd, bi navê MST pêk anîn.

Piştî 30 salan, ciwanên vê tevgerê bi zehmetiyên din re rû bi rû diman. Konsantrasyona zeviyan zêdetir dibû û dijmînê wan jî bi saya hevalbendên xwe yê tacirên çandiniyê xurttir dibû. Herwiha, dadgehê jî ev tevger krîmînalîze dikir û bi saya bidestxistina fînansmana navdewletî jî, bi gelek spekulasyonan, rê li ber Reforma Çandiniyê digirt. Lê ciwanên vê tevgerê di qadên civakî de rêxistina xwe organîze kirin û Reforma Çandiniyê ya Populer ava kirin. Vê sibatê, di 6em kongreya MSTyê de Pêkhateya Sêyem a Ciwanên Bê'erd cihê xwe girt û di wê pêkhateya tevgerê de hejmara wan gehiştibû 2 hezar kesan. Li wê derê, me li hember kêşeyên sereke biryar da ku em tekoşîna xwe bidomînin: Me soz da ku em ê çewlikên çandiniyê yê ku bêyî dermanên kîmyewî bo kuştina heşerat pêk bînin û di van çewlikan de em ê çandiniyêke ekolojîk pêk bînin ku bibe modeleke baş ji bo pêwendiyên mirovan li gel teb'etê. Di bin banê kolektîfeke ciwanan de hem em ê pêwendiyên nû yê kulturî, civakî û zayendî pêk bînin hem jî li bajaran em ê tevî berxwedana ciwanan bibin. Me di wê pêkhateyê de soz daye ku em ê enternasyonalîzmê û mîlîlaneya enternasyonal bikin parçeyek ji pratîka jiyana xwe. Heta ku karker û rêncber bigehin mafê xwe, zext û zordariyên li ser însanan bi dawî bibin û kedxwîrî ji holê rabe, ev berxwedana ciwanan ku di bingeha wê de dîsa tevger û serhildana karkeran heye, dê berdewam bike.

Tekoşîn li hember desteserkirina 'erdan

Julia Bar-Tal, Rêncbera Xudana Mêşên Hingivînê, 45 km dûrî Berlînê û endama Bündnis junge Landwirtschaft – Konfederasyona Çandiniya Ciwanan, û endama Abl, Via Campesinaya Almanayê, û endamê organîzasyonê

Roja îro em wek rêncberên ciwan ên Rojhilatê Almanayê, rastî gefxwarineke mezin a destdanîna ser 'erdan tînin. Wek rêncberêka ciwan ez di jiyana xwe ya rojane de neçar dimînim ku berxwedanê her û her xurt bikim li hember wan tacir û sermiyandarên navdewletî, ji ber ku hêdî hêdî dixwazin dest danin ser 'erdên me û wan ji bin piyên me bikêşin. Di dîroka sosyalîzmê bi xwe de jî ev ax her û her bûne malê dewletê û vê gavê jî dewlet naxwaze rêncberên wan 'erdan berhemhênanana xwe ya çandiniyê bidomînin, li şûna wê bi polîtîkayên neolîberal, rê li ber sermiyandaran vedike ku bînin li van deran binêcîh bibin û van 'erdan bikin mulkê xwe. Ev du sal e em hewl didin ku li hember vê dagîrkeriya wan a 'erd û zeviyan me, berxwedaneke xurt pêk bînin û em bi ser ketin jî. Wek rêncberêka ciwan, ez dibînim ku berxwedaneke şexsî jî nîşanî me dide ka ev berxwedana me ya pratîk nîşanî me hemûyan dide ku di jiyana me hemûyan de ev xeteriya li ber 'erd û zeviyan me tiştêkî çawa ye û em ê çawa li dijî vê tîbîkoşîn. Yê ku li bajaran li ber xwe dan û yê ku di Konfederasyona Rêncberên Ciwan de bi tekoşîna xwe rê li ber me vekirin, li Rojhilatê Almanayê hêz dane berxwedana me jî. Û li gel hevalên xwe yê li bajaran, me peywend û paşxaneyê berxwedana xwe kir yek. Bi wan protestoyan berxwedanê me tevî hev bûn û me rêyên hevpar peyda kirin. Bi sata vê berxwedanê jî me li hember tunekirina serdestiya xurekên siruştî û destdanîna ser 'erd û zeviyan xwe, bi rêya kîrîn û firotinê, tekoşîneke kolektîf derket meydanê.

Ciwan Li Ber Xwe Didin

Norman Chibememe, Zîmbabwe, Forûma Herêmî a Rêncberan (ZIMSOFF)

Li Zîmbabweyê, qîz û xortên ku diçin mektebê, bi tîra xwe karê çandiniyê ve eleqedar in. Ciwan, bi metodên organîk/siruştî û fêrî û feraseta sistemeke ekolojîk di vî karî de cih digrin. Pêkhateyên rêncberan bi gelemperî berê xwe didin parastina siruştiya tovên çandiniyê û ji bo qalîteya wan û zêdekirina berhemhênanê û parastina nijada tovan. Li cihên ku guherîna îqlîmê

û germiya hewayê rewşa çandiniyê xirab dike, rênçber bi tovên dexlî yê “fushai” hem bi rehetî berhemhênana xwe zêdetir dikin hem dikarin li gelek deveran rê li ber birçîmayîna însanan bigrin û ji bo wan jî ev baştirîn berhemhênana çandiniyê ye. Bi saya berhemhênaniya ‘edetî, ciwan dikarin tovên dexlî bi dest bixin û li gel vê yekê jî hîn teknîkên ‘emilandina avê dibin di çandinî û bêrhevkirina de û çandiniya parêzger jî (veguherandina hêşînahiyê, dîzaynkirina axê û hwd..) ji bo wan xalên hînbûnê ne. Gelekên wan ji bo karê firotin û pêşkêşkirina berhemên çandiniyê çalak in di pêkanîna şîrketên malbatî de. Perwrdeya ciwanan bi rastî jî gelek girîng e, ji ber ku piştî qursên çandiniyê, rênçberên bi hezaran ciwan berê xwe didin çewlikan, peymanan îmze dikin û ji bo pêşxistina çandiniya xwe dixwazin perwerdeya çandiniyê bidin wan. Ev belgeyên çandiniyê alîkariya koma wan dikin ku bizanin di warê çandiniyê de çi netewî û çi navdewletî, kîjan pêşketin û guherîn hene.

Programeke baş ji bo çandiniya ciwanan

Papa Bakara Coly, bi navê “papis” Serokê Şaxa Ciwanan a Koperatîfa Mezin a Meclîsa Netewî. (CNCR), Senegal

Heke mirov rewşa betaliya ciwanan bifikire, di nav sektorên din de ji bo îstîhdama ciwanan li Afrîkayê herî zêde çandinî divê bibe warê teşwîq û piştgiriya. Lê mirov dibîne ku li gelek welatên Afrîkayê di warê amraz û materyalên çandiniyê de kêmasiyên mezin hene. Bo nimûne Senegal, polîtîkayeke dewletê tune ku berê ciwanan bide çandiniyê. Tenê çend însiyatîf – program û projeyên biçûk- hene ku ciwanan teşwîq dikin ku bibin rênçber lê tevî hin aliyên serkeftî di van pîlan de gelek nakokî jî hene.

Nakokiya sereke ew e ku armanc û şêweya rêvebirina van programan eşkere nehate diyarkirin. Li şûna ku ciwan bi xwe materyalên çandiniyê binecih bikin, di van programan de gelek kêr rênçber dibin xwedî piştgiriya dewletê (pirraniya rênçberan ne xwedî perwerdeya çandiniyê ne û gelekên wan jî ji gundan bar dikin diçin bajaran û divê ji çandiniyê berdidin) lewma jî ev programên dewletê ne dikarin îstîhdamekê pêk bînin ne jî dikarin asta refaha dewletê bilindtir bikin. Di encama van programan de ji aliyê sermiyanê ve pirr kêr derdikeve meydanê û rênçberên ciwan ên ku li çewlikan hatine binecihkirin jî naxwazin bi vê karê kêr zêdetir xwe mijûl bikin.

Tiştê ku di destpêka koleja CNCRê de em motîve kirin, ev rewşa çandiniya rênçberên ciwan bû. Hewldanên me ji bo wê bûn ku di sektora çandiniyê de yê nûhatî wiha bifikirin “armanca vê projeyê baş e em ê vê biceribînin, berî her tiştî yê ne ku jixwe li wê derê bûn bila bi serkeftinê yê din motîve bibin û xwe ew jî wek yê din bixwazin ku berê xwe bidin pêkanîna rêbaza xweser a çandiniyê.”

Parvekirina Tecrubeyan

Dan Kretschmar, Yekîtiya Netewî a Rênçberan – La Via Campesina, Kanada, Rênçberê ciwan ê malbatê û endamê Kolektîfa LVC ya Ciwanên Bakurê Emrîkayê

Malbata min li Ontariya Kanadayê rênçberiya zebzeyên organîk dike û ez jî li wê derê alîkariya malbata xwe dikim. Di civîna herêma ya Californiyê de ez jî bûm endamê delegasyona ciwanan a Yekîtiya Rênçberên Ciwan ku parçeyek ji La Via Campesinayê ye. Ez 5 rojan li gel hevalbendên ji Emrîka û Meksîkoyê mam û piştî wê jî hem enerjîya min bo berxwedanê zêde bû, hem jî ez pê hesiyam ku fikr û ramanên min guherîne û xurttir bûne. Ji bo min tecrubeyeke ‘ezamet bû. Min li wê derê guh da çîroka rênçberên koçber û xebatkarên koçer ên çewlikan ku heta niha nehatine qeydkirin, ji ber wê jî ez gelek heyirî mam û pê eşiyam; berxwedana wan ji ya me zehmettir e û rewşa wan diwartir xuya dikir. Di vê sîstemê de gelek problemên çînayetiye hene. Karkerên ku narinc û tirincan berhev dikin ji ber dermanê heşeratan rastî nexweşiyên

çermî tèn û xaniman ducanî ji ber wan dermanên xirab neçar dimînin bi wî halê xwe jî bixebitin. Ez gelek xemgîn bûm dema min ev rewş dît, ji ber ku modela endustriyel a çandiniyê tiştêkî wiha pêşkêşî me dike. Meseleya karkerên koçber li herêma me yek ji wan problemên sereke ye. Wê dema ku ez hatim civîna LVCyê, pê hesiyam ku heçko ez hatime nav malbatekê. Li van çewlikên biçûk ên herêmê ev problem têne dîtin. Min bi xwe qerar daye ku ez ji bo guhertina vê rewşê li ber xwe bidim. Divê em hemû bi berdeyamî hewl bidin û têbikoşin ji bo mafên rewa yên gundî û rencberan, da ku ev fikr û ramanên însanan li ser vê meselê biguherin. Hemû mesele ji zulma li ser rencberan dest pê dike. Hikumet ji bo ku me bixapîne carna wek êm, hin kurtêlan davêje ber me, lê divê em bi van taktîkên wan nexapin. Tekane rêya me ew e ku em van kurtêlan bigrin û bavêjin ser serê wan, paşê jî bi hemû dengê xwe li ruyê wan biqêrin: “Ev têra xwe ne baş e!” Peydakirin rencberên yêdek, ne çareseriyek e. Li her derê cîhanê, pêkan e ku em gelek cîhanan pêk bînin.

Xwendekar û Rencber, Karwana Ciwanan a Endonezyayê ber bi #endWTO

Karwana Ciwanên Endonezyayê a di nav Teverga Xurekên Ciwanan, di 25ê Çiriya Paşî bi 45 endamên xwe yên zîrek, ji bo herêma serbest a ticariyê û ji bo xilasiya WTOyê, ji Jakartayê bi rê ket. Du mêvanên navdewletî li gel wan bûn û temsîla Başûrê Asyayê dikirin. Pathak Lal Golder ango BKF-Federasyona Gundiyên Bangladeşê û Savitha BC li ser navê Karnataka Rajya Raitha Sangha – Saziya Rencberên Eyaleta Karnatakayê, Hindistan)

Patak wiha dibêje: “Min xwest ez tevî karwanê bibim ji ber ku min dixwest ez teverga gundiyên Endonezyayê nas bikim. Stratejiya wan ji bo avakirina berxwedanekê û terzejiyana gundiyan, bala min li ser wan bû. Min dixwest ez têbigehim ka ji bo mafên xwe yên rewa çawa li ber xwe didan.” Savitha jî van gotinan lê zêde dike: “Min xwest ez fêhm bikim ka tevgerên Hindistanê pêwendiyên çawa li gel tevgerên Endonezyayê datînin, bi taybetî jî teverga ciwanan. Dema min dît ku ji bo çareseriyê meseleyên gundiyan tekoşînekê dimeşînin, ez gelek keyfxweş bûm û min bi çavê serê xwe dît ku ew bizavên ciwanan û bizavên rencberan bi hev re li ber xwe didin. Ez xortek im û zanîngehê dixwînim. Dibe ku ez gelek fikran ji Endonezyayê bînim bo teverga me ya ciwanan a bi navê “Henga Hêşînahiyê”.

Rawestgeha yekem Cirebon bû û li wê derê Ciwanên Karwanê, li gel masîgirên Serikat Neyalan Indonesia (SNI) civiyan. Bi wan re behsa meseleya şîrketên masîgiriya yên navnetewî kirin û li ser problemên masîgirên herêmî axivîn. Masîgirên ku wek wan şîrketên mezin nedikarin heta nava oqyanûsê biçin û zêde masiyan bigrin, ji neçarî na koçî Erebiştana Siudî dikirin an jî bo xebatê berê xwe didan Taylandê.

Li Semarangê, Karwana Ciwanan, li hember avahiya hikumetê serî hildan. Pathak ji bo wê wiha dibêje: “Berxwedanekê kêrhatî bû. Piştî wê hikumetê qebûl kir ku bi nûnerên Teverga Xurekên Ciwanan re biaxive. Dû re jî qebûl kirin ku ji bo parastina serdestiya xurekên siruştî hewl bidin. Herwiha biryar dan ku li hember guherîna îqlimê û germbûna global jî planeke xebatê danîn. (Jixwe di peymanê WTOyê de wê yekê cih digirt.)

Rawestgeha duyem Solo bû, bajarê çalakiyên kulturî-hunerî ku li wê derê teatra kolanê jî hebû. Savitha wiha dibêje. “Xwendekarên jin rabûn û li ser parastina xurekên siruştî, piyeseke dramatik pêşkêş kirin. Min ji bo zanîngeha xwe feyzeke baş ji wê derê girt, ji ber ku li aliyê me Karnatakayê tiştêkî wiha nîn e.”

Li Zankoya Veteran a Surabaya, di Semînera Navdewletî ya WTOyê de herdu rencber Savitha û Patak, tecrubeyên xwe bi hev parve dikin. Savitha behsa pîraliya xetereya destdanîna ser ‘erdan, rencberên rûnçêker, wekustina rencberan û jinên rencber dike. Herwiha bi serenavê #endWTO kampanyayek dest pê dike, Pathak behsa wê û alternatîfên parastina serdestiya xurekên siruştî jî dike. Rawestgeha sêyem û bajarê sêyem Banyuwangi bû û li wê derê rastî

komîteya Baffelê hatin ku ji 1995an ve li dijî zêrgeran li ber xwe didan. “Ev kom ji aliyê hêzên paramîlîter ên zêrgeran ve rastî gelek êrîşan hat, hinek ji wan hatin kuştin û yê mayî jî bi tirs û xof dijîn niha. Endustriya lêgerîna zêran ne tenê dest danî ser ‘erdên wan, herwiha hizûr û aramiya wan jî xira kir. Xelkê herêmê gelek ji ber vê êşiya.” Savitha dawiyê behsa vê jî dike.

Ji bo xwendina temamiya gotarê, bitikîne vê lînkê: <http://lvcsouthasia.blogspot.in/2013/11/2-of-our-own-in-indonesian-youth.html>

Li Ewropayê ciwan ‘erdan dikirrin

Kirrina ‘Erdan (RtF) tevgerê kolektîf e ku armanca wê vegeandina ciwanan e bo ser ‘erdên xwe û daxwaza erka kontrolê dike li ser çandiniya wan ‘erdan. Qerara me ew e ku bi rêya alternatîfên wek şirketên xweser û biçûk, kolektîf û însiyatîfan li hember çerxa global a kapîtalîzmê em hewl bidin û lazimiyên xwe pratîk bi teoriyeye xurt pêk bînin. Bi rêya La Via Compesina, ji sala 2007an heta roja îro, bi sedan kamp li Ewropayê hatine avakirin û beşdarên van kampan li welatên wekî Avûstûrya, Swêd, Belçîka, Katalonya, Îngilistan, Fransa, Almanya, Macaristan, Potekîz, Îspanya, Sûesîya, Swîsre û Yewnanistanê li gel wan komikên aktîf yê herêmî, tevî armanc û daxwazên xwe yê herêmî bi hezaran însan tevî vê tevgerê bûn û çalakiyên wan her û her berdewam in. Em dixwazin ew sînorên di navbera muşterîyan û rêncberên profesyonel de bîn şikandin da ku li dora fikreke hevpar bicivin. Herwiha em dixwazin li gel niştecihên kolit û taxên xizanan, rêncber û muşterîyan bi rêya zevî û baxçeyên herêmî bi hev bidin nasîn da ku li gel hev bikaribin însiyatîfêkê pêk bînin. Di navbera 30ê Çileyê Paşîn û 2yê Sibatê de 40 kes li Burg Luttera ku li naverasta Almanyayê ye cara yekem li vê herêma Almanî-axêv bi hewldana RtFyê civiyan. Ji aliyê serdestiya xurekên siruştî û nîqaşên “ekonomiya kesk” û desteserkirina ‘erd û zeviyên Rojhilatê Almanyayê, baxçevaniya nav daristanê, parastina tovan û hwd.. kampeke gelek serkeftî bû û bi dehan gotar hatin pêşkêşkirin, komxebat û karên pratîk pêk hatin. Ev destpêka xebatê bû ku li vê herêma Almanî-axêv (di nav însiyatîfa koma RtFya Ewropayê) hate lidarxistin. Hem ji bo parvekirina tecrubeyan, hem ji bo rasterast organîzekirina tevgerê, çalakiyê baş û serkeftî bû. Ji bo bêhtir agahiyên li ser vê kampê, ji kerema xwe bixwînin: <http://www.reclaimthefields.org/de>

Pêkhateya Ciwanan a CLOC LVC

Zêdetirê bîst salan, li Emrîkaya Latîn û Karabiyenê, tevgerê nasnamayî û yekgirtî bi navê CLOC (Koordinasyona Organîzeyê Gundên Latînoamerîkan) bi rêya Via Campesina, qîz û xortên çolterên Emrîkaya Latîn, tevî vê prosesê polîtîk bûn. Piştî sê civînên mezin ên sala yekem, Meclîsa Ciwanan a Parzemîne û delegasyona wê di bin banê CLOC LVCyê de hat avakirin, rê û rêbazên xebata wê hat diyarkirin. Ev pêkhate fersendek e ji bo diyaloga tevgerên ciwanan, nîqaş û gengeşeyên biryardanê, di nav Meclîsa Ciwanan a Parzemîne de. Dê ev pêkhate bibe forûmeke rêvebirin û kontrolkirina proseyan berxwedan û tevgerên ciwanan. Çalakiyên vê pêkhateyê jî dê rê li ber ciwanan veke ku bi dînamîkên xwe li hember problem û karesatên kapîtalîzmê bibin çareserî û bersivê û ji bo vê jî dê bibe qadeke perwedeya siyasî. 8ê Çiriya Pêşî, wek roja yadkirina şoreşgerê nemir Che Guevara û ev roj wek roja hevgerî û mîlmilaneya tevger û berxwedana ciwanan. Ev tevgera hevpar, sala 2014an ji bo zêdekirina diyalogê, bi armanca pêkanîna tevgerê gerdûnî hatiye hîlbijartin. Sala 2015an em ê li Arjantînê 4em Meclîsa Ciwanan a Parzemîne bicivînin û di sêminêrên vê meclîsê de em ê cih bidin van sernavan: Çandiniya ekolojîk, Enerjî û Guherîna Îqlîmê, Serdestiya Xurekên Siruştî, Xwegihandina Çolter, Herêm û Çavkaniyên Siruştî, herwiha Koçberî, Tenduristî, Perwerde û Xebatên Siyasî.

Li hember talana sermiyan û mêtîngiriyê, Emrîka Li Ber Xwe Dide! Ji bo azadiya axê û serbestiya însanan, Emrîka Li Ber Xwe Dide!

Ji bo guhdarî, temaşek û parekirinê

Deklarasyona ciwanan ji Jakartayê:

<http://www.viacampesina.org/en/index.php/our-conferences-mainmenu-28/6-jakarta-2013/resolutions-and-declarations/1452-declaration-of-the-3rd-international-youth-assembly-of-the-via-campesina>

Tevlêbûna ciwanan li çandiniya Afrîkayê, Jose Mateus

https://www.youtube.com/watch?v=CCmSN_rXBs0#t=116

Dahatuya ciwanên Ewropayê di çandiniyê de (tenê bi spanî û fransî) Jeanne Verlinden

http://revistasoberaniaalimentaria.wordpress.com/2012/12/02/el-futuro-para-la-juventud-europea-en-la-agricultura/?relatedposts_exclude=2246

Ji nû ve kîrîna 'erd û zevîyan, malpera sereke:

<http://reclaimthefields.org/>

Tevgera Çandiniya Katolîk a Navdewletî û Ciwanên Gundî, malpera sereke:

<http://mijarc.org/>

Yekîtiya Rêncberan a Netewî (NFU), malpera ciwanan, Kanada:

<http://www.nfu.ca/about/youth>

Berlîn, Em Tekoşinê Geş Dikin: <http://viacampesina.org/en/index.php/main-issues-mainmenu-27/sustainable-peasants-agriculture-mainmenu-42/1559-germany-wir-haben-es-satt-we-are-fed-up> http://www.eurovia.org/?lang=en&var_mode=calcul

Em in tovên axê de kok berdidin
Em ên darên ku fêkiyan didin
Em dihejînin keleha zulmê, hêstir dikeve çavên wan
Di civîna ciwanan a Misticaya Bakurê Emrîkayê, bajarê Matola, Çiriya Pêşîn a 2008ê
hate qeydkirin.

Jiyana me tev gund e
Cîhan me têr dike
Çem û robar diherikin nav xwîna me
Em ciwananên La Via Campesina
Îro em mizgîniya destpêka cîhanê nû didin we

Ji çar aliyên cîhanê em hatin
Ji bo ku em bi hev re bin bi ruhê berxwedanê
Bixebitin bi hev re hêviyê biafirînin
Bixivin li ser hêza serhildana xwe
Bizanin xebat û karê li gel hev
Bikin yek hemû bizav û berxwedanên pêkhatî
Biguherînin civakê, bi hêz û qeweta yekgirtî

Em ji vir diçin çar aliyên cîhanê
Li gel xwe digerin ruhê pak ê şoreşê
Bila her kes bizane pêkan e cîhanek din
Û ji bo jiyana xwe em neçar in li ber xwe bidin
Heta serkeftinê em ê şer bikin
Heta ku ciwanên vê cîhanê bikarin bi rehetî bijîn
Li wan gundên aştî û hizûr û aramiyê

Dewlet dema êrîş kir, heke xwest me têk bibe, em ê bikin yek û qewî bikin berxwedanê
Heke hevalek ket 'erdê, em ê wî rakin ser piyan
Heke li me sar be jî em ê hev hembêz bikin
Wê demê agirê berxwedanê dê germ bike dilê me

Em ê her roj ruh û canê xwe
Li gel hiş û mejiyê xwe, bidin ber tekoşînê
Û şer bikin bo jiyana
Şer bikin bo La Via Campesina

Berhema kolektîf ji 2yem Meclîsa Ciwanan, li Matolayê, Çiriya Pêşîn, 2008
<http://viacampesina.org/en/index.php/component/content/article/2-uncategorised/627-la-via-campesina-greatest-hits>